# Belê Lotta kare bajo

Astrid Lindgren

Ilon Wikland



KURDISKA FÖRLAGET

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

JEV 320

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Belê Lotta kare bajo

Astrid Lindgren

Ilon Wikland

Institut kurde de Paris



KURDISKA FÖRLAGET



Institut Kultur de Paris



Institut kurde de Paris

"Belê, ez dıkarım pısqlêt bajom", got Lotta bı gıri."Bıramın, ku ez dıkarım! Bı dızi!" Lotta, lı derve, lı ber derıyê xani yê zer ê kuça Bråk makar, ku lê rûdınışt sekınibû.Lı wê derê runıştıbû, dit, ku Jonas û Mia Maria bı pısqlêtên xwe bı dengeki pêt jı kaşê ber bı jêr de tên.Vê yekê, Lotta gelek ture kır.Lê belê, ew hin bes pênc sali bû û wê nızanıbû pısqlêt bajotana, ne bı dızi ji.

"Na, tu bıçûki", got Jonas, dûvre, gava ew lı metbaxê, jı bo şivê rûnıştıbûn.
"Û jı xwe pısqılêta te ji tune", got Mia Maria, " bes yeka kevna bı sê teker."
Wê gavê, Lotta hin turetır bû.
"Hûn dıbizın", got jı bav û dıya xwe wan re: "Çaxa pısqılêta mın tune be, ez nıkarım pısqılêtê bajom." Dûvre, parıyek jı sandewiça xwe jêkır û dı devê xwe de axaft: "Lê disa ji ez dıkarım pısqılêtê bajom. Bı dızi!"
Gelek tıştên dın ji bı dızi dıkır, Lotta.Wê tım bahs dıkır, dıgot:"Ez dıçım dıbıstanê ji." Fêr bûbû dıgot:" bı dızi."

Carekê, gava Lotta çûbû mêvanıya cirana tenışt; meta Berg, wê gavê, meta Berg got: "Çıqas ecêb! Jonas û Mia Maria, her du ji çavên wan şin ın, lê yên Lotta, hema hema wek kesk ın."Wê gavê, Lotta gelek bı qerar got:
"Çavên mın şin ın, lê bı dızi." Lewra, Lotta hergav dıxwest wek Jonas u Mia Maria be.
Lotta, êvarê, gava dıçû ser nıvina xwe, jı bo razanê, got:" Bes kevnekotek bı sê teker, çı bê aqıli!" Vê yekê jı Bamsen ra got.Gava, ku Lotta razana, ew hertım lı cem bû.Bamsen ne hırçek wek ku mırov dızane bû.Ew, berazek hêsa, ku dıya wê jê re dırûtıbû. Lê, disa ji Lotta, navê wê kırıbû Bamsen û jê re behsa her tışti dıkır.

Institut kurde de Paris





"Yê, ku baş guhdarıya mın dıke, bes tu yi"got, Lotta."Jonas û Mia Maria, ew qet guhdarıya mın nakın û tu tışti ji fam nakın." Erê, jı xwe ji Bamsen gelek baştır bû û nıha ji lı cıyê xwe vezelıyayi, guhdarıya planên Lotta, ku behs dıkır û dıxwest dı pêş de çêke dıkır.

"Ger ez dı sersala bûna xwe de pısqılêtek rastin bıdest nexım, wê gavê ezê bıçım, yekê bışelinım," got Lotta, "bı dızi."

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Pışti du rojan, sersala bûna Lotta bû. Dema wê pênc salên xwe tıje kır, dıya wê, bavo, Jonas û Mia Maria, serê sıbê bı mûm û pasteyan hatın, jı berêvkê de ji dıstıran: "Belê, bıla ew bıji!" Jı Lotta re gelek dıyari anin.Lê ne pısqılêt.Jê re sê heb texsıyên bıçûk, pırtûkeke wênan, beneki holbûnê, hêlekanek nuh, jı bo , ku bı daran ve gırêbıde û çentek mıla yê gelek cıwan– lê ne pısqılêt!

Bavo got: "Tu dıkari pıçeki dınê ji bı sê teker a xwe idare bıki. Lotta, jı hemû hediyan ji gelek hez kır û jı bo vê gavê ji pır lı ser pısqılêtê nesekıni. Ew wê sıbê geleki kêfxweş û bı jin tıje bû. Û bı texsıyên xwe leyıst, lı wênên pırtûkê mêzekır, bı benê holbûnê xwe holkır û dı hêlekanê de çû hat.;



Institut kurde de Paris



Institut kurde © de Paris

Ew, dı kuça Bråkmakar de bı çentê xwe yê mıla derket gerek bıçûk.Lı kuçê, rasti komırvanê, ku jı mala meta Berg derdıket hat û jê pırsi: "Ez jı çentên sor gelek hezdıkım, gelo, tu ji heznaki? "
Komırvan, lê vegerand û eşkere kır ku ew ji jê hez dıke.Gava Lotta, vêya bıhist, hin kêfxweştır bû.



Institut kurde de Paris



Lê gava, ku ew hat malê û dı quncık de çav bı pısqlêta sê teker ket, hêrs bû banz da, çû wê da ber pênan.Bı hêrs: "Ez nıkarım idara xwe bı te bıkım," got," bes bavo ye ku wısa dırame!"Bı rasti, wê jı bıni jıbir kırıbû, ku beri vê du salan wê dı sersala bûna xwe de vê sê tekerê stendıbû.Û nıha ji pısqlêtek rastin dıxwest.
"Ez dızanım jı ku yek wılo bıdızım" got. Pısqlêtek kevn lı embara mala meta Berg dısekıni, wê ew ditıbû: "Ez dıramım, ku wêya bıgrım," got jı Bamsen ra, " û dıxwazım tu ji bı mın re weri."

Lewra, Lotta nedıxwest bı serê xwe tenê here dızıyê," lê dıvê em bıpên, heta meta Berg razê, " got Lotta.De bala xwe bıdınê çı bıçûkek şerrût e !

Institut kurde de Paris

Lotta, ber bı mala meta Berg ve çû, da mêzeke gelo, ew razaye, an na.Hin raneza bû, lı ser sedırê rûnıştıbû, qazax çêdıkır. Û wısa xwıya bû ku zêde xewa wê ji nayê. Statty, kûçıkê dıjwar ê meta Berg, ewtıya û ber bı Lotta de banzda.Lê Lotta jı berê de wi dınasi, lewra ji netırsıya."De bes bıewte," got Lotta, "sersala bûna mın e û her tışte ji."

Dûvre, jı meta Berg re got:
"Wek tê gotın- texmin bıke iro sersala bûna kê ye? "
"A te ye, ez dızanım," got meta Berg û çû ber dexilê, pakêtek bıçûk ani, got: "Piroz be , Lotta bıçûk!" Lotta, pakêtê bı lez çırand.Dı navê de tışteki bıçûk hebû û jı nav wê ji bezınek bıçûk bı kevırên kesk û şin derket.Lotta bı hemû şêla xwe da nişan, ku çıqas kêfxweş bû: " Ûû, çıqas bazınek cıwan!" Wê gelek caran spasi meta Berg kır.Got:
" Tu baştırê hemiyan i."Bı lez, bazın xıst destê xwe û dit, ku kevırên wê çıqas dıçırûsinın.
"Vêya hema hema wek pırlanta ye," got Lotta bı kêfxweşi.
"Ne ewqas." got meta Berg.



Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Lê dûvra, jı nıfşkê ve hat bira Lotta, ku wê çı bıkıra, ruye Meta Berg mızda û got:
"Ger ez dı şûna te de bûma, êvarê nıha ezê razabûma."
"Belê, dıbe ji, Lotta bıçûk", got meta Berg.
Dûwre, bazın dı desta da û Bamsen dı hembêzê de, Lotta çû.
"Te dit, em çıqas şerrût ın," got Lotta bı dılşai.
"Û ewê gavek dınê razê, tê bıbini."

Dûwre, Lotta bêdeng, bı dızi çû enbarê û bı Bamsen re pa.
Wê, pa pa, heta ku hema hema ew bıxwe ji dıkıra dı xew re bıçuya.
Lê dawıya dawin got:
"Emê nıha despêkın!" û rabû destpê kır, Lotta .


Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Lê jı ber ku Lotta pıçûk û pısqlêt ji mezın û derxıstına wê zehmet bû, beri ku jı cih derxe çar caran ket erdê pısqlêt. Lotta ramıya, ku bı rasti ew pısqlêt din û nebaş bû. Lewra ji her car ket erdê û dı canê wê de wermên şin çêkır û lıngê wê ji çırıya.
"Lê tu bısekıne, heta ez jı derencan derkevım jor" got Lotta bı hêrs. Vêya jı Pısqlêtê re got.

Bamsen danibû pışt xwe, ser cihê pakêtan. "Xwe baş bıgre" got wê, "jı ber ku ez dıramın wek Jonas û Mia Maria bajom pısqlete.
U bı ve axaftıne re Lotta, bı pısqlêtê ber bı pala(kaşê) kuça Bråkmakar ve kışıya.
"Beri mırov baş bajo, dıvê mırov derkeve jor." got wê bı bıhnek çıkıyayi.



Institut kurde de Paris

Dema mırov bıçûk û pısıqlêt mezın be jı derencan hılkışin ji bı rasti dê zehmet be.Lê şansa(sıûda) Lotta hebû. Hına sındoqek danibûn rex rê, vêya alikarıya Lotta kır, da ku karıbe hılkışe.

"Ka bıramın, lê rast hat", Lotta got û dûvra bı carekê de gıhişt derencan.




Institut kurde de Paris



"A nıha tu, Bamsen, tu de vıziniki bıbıhizi Lotta got û axaftına xwe xelas nekırıbû, ku bê hemd pısqılêt bı rê ket.Ew jı Jonas û Mia Maria zûtır û xırabtır, serejêr de bı rê ket. Raste, heta nıha lı kuça Brakmakar tu kesi vızinek ûsa nebıhistıbû. "Pêl frênê bıke!" bı qirin got. Lotta, "pêl frênê bıke!" Lê pısqılêtê nıkarıbû pêl frênê kırana û Lotta ji nıkarıbû. Lotta û Bamsen berbıjêr lı ser pısıqlêtê ûsa dıçûn, ku vızinike bılınd jı wan dıhat. Belê, bı rasti ji idi Bamsen vıziniki dıbıhist!

Institut kurde de Paris




"Hewar, bıghijın" Lotta bı qirin got, "bıghijın!"
Lê pısqilêtê bı rıya xwe de dom dıkır. Heta dawıya rê domkır û lı wır, lı ber mala meta Berg, bı dengeki mezın lı deriyê xani ket û Lotta pekıya ser seri ket ber koma pûşeki jı yên Mala Berg. Gava qirini jı Lotta hat, lı mal meta Berg jı cıyê xwe pekıya jor û bı tırs bazda ber koma pûş:

"Ev çı bû hat serê me", wê got, "Tu çı dıki, Lotta? "
Lotta qiriya û got: " Dı vê roja bûyına sersalıya xwe de pısqilêtê dajom".
Belê, bı rasti ji wê nedıxwest dı roja sersala xwe de ser seri here erdê.
"Berxıka mın", got meta Berg, "zêdetır kê dera te dıêşê? " Wê gavê Lotta dengê xwe bri û xwest da bızanıbe zêdetır kê derê wê dıêşe."Her derê", got Lotta bı hêrs "enıya mın". Destê xwe da ser enıya xwe.Lı wır wermek mezın çêbûbû.

Institut kurde de Paris

Gava xwest dest bı gıri ke çavê wê lı tışteki hin xırabtır ket. Jı lıngê wê xwin dıhat. "Xwin", got bı qirin.Qirina wê lı her derê kuça Brâkmakar hat bıhistın: " Xwin dı ser sala bûna mın da!"
Û ew qirıya, û qirıya, û qirıya, jı ber xwinê û werma enıyê. Û pıçek ji jı bo şıkandına pısqilêtê, gelo dê meta Berg çı bıgota, wê meraq kır.



Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris



Lê meta Berg tu tışt negot, Lotta'yê bır hundır û lı metbaxê brina we şûşt û derman kır. Û dûvra pısqılêtê gırt, bır dani embarê.Lotta dit, ku meta Berg pıçeki hêrsbûyi xûya dıke. "Lê mın pısqılêtê bes jı bo demek gelek kurt gırtıbû", got Lotta."Bes jı bo ku tu razayi bûyi, tu dıkari mın jı bo vê efû bıki? "
"Belê", got meta Berg, "Lê pısqılêtek ûsa mezın jı bo te talûkeke mezın e. Jı bo te yeka bıçuktırin dıvê."
"Ango yeka bı sê teker", got Lotta bı carekê ve. "Bavê mın ji ûsa dıbêje."
"Na, pısqılêtek bıçûk a rastin", got meta Berg.
"Tu jı bavê mın re bêje", got Lotta.
Û paşıyê disa dest bı qirini kır: "Bazınê mın", got, "Mın bazınê xwe xıstıye!"

Belê, bı rasti ji ûsa bû. Êdi bazın dı destê wê de nin bû, û ne dıçırûsand.
"Dıvê em lê bıgerın", got meta Berg. Dest pê kırın, meta Berg û Lotta lê gerıyan, gerıyan, lı embarê, lı kuçê, lı her deri. Lê lı tu cıhi ji bazın tune bû.

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

Êdi Lotta çû malê. Ew dı rê de wer gırıya û gırıya ku gava Jonas û Mia Maria bı pısqılêtê jı dıbıstanê dıhatın, jı dûr ve dengê wê bıhistın. Lı ber deri rasti Lotta hatın.
"Tu jı bo çı dıgri, Lotta", got Jonas.
"Jı bo ku ser sala bûna mın.....", got bı qirin Lotta.

Gava Jonas û Mia Maria xwestın bızanıbın ka jı bo çı Lotta wer dırame "Ez jı we re bêjım", got Lotta berê û dawıyê jı wan re got. Wê jı wan re hım behsa pısqılêtê hım ji behsa bazınê wındabûyi kır. "Heqê te ye û başe ku te bazın xıst", got Jonas.

"De ka mêzeke nıha", got Mia Maria, "meta Berg dılovan e û bazıneki dıde te, tu ji radıbi dıçi pısqılêta we dışelini.
Jı bo vê ji, heqê te ye û
başe ku van tıştan bı serê te de hatın."
Lotta deng nekır û fedikır.
"Ez naxwazım bı we re qıse bıkım", got wê.
Û dı bın dara lı ber deri de xwe qlûz kır.
Bavê wê wê jı kar bıhata, lewra ji lı hêvıya bavê xwe sekıni.
"Lê disa ji ez dıbêjım , ku ser sala bûna mın bê yom e", got Lotta jı Bamsen re. Bamsen ji lı cem bû.

Lı cıyê xwe rûnıştî, temaşa Jonas û Mia Maria ku lı ser pısqlêtê bûn, dıkır.
" Şşş...., me ji ûsa dıkır, ne ûsa", got Lotta jı Bamsen re. Lê dûvra serê xwe bı bêdıli hejand.
"Jonas yeki din e, ka bınêre çawa dajo", got wê.Belê,yek caran Jonas destên xwe berdıda û bê ku bı cıheki bıgre dajot.
"Lê dıya me gotıbû ku dıvê tu ûsa najoyi", got bı qirin Lotta.
"Lewra ev qedexe ye, bıra dı bira te de bê!"



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

**Lê dıvê gavê de çavê wê lı bavê wê ket û hındık ma ku bıkeve erdê.
"Wi tıştê dı dest bavo de çıye, gelo ne pısqılêtek be! Pısqılêtek bıçûk û xweşık!"
"Ev çıye, mın tıştek fam nekır", got Lotta.
Lê dûvra bı dengeki ûsa qırıya ku dıya wê jı paca metbaxê lı derva mêzekır û dayık dı tışteki negıhişt.**



"Ev çıye", got dê, "Me bıryar stendıbû, ku Lotta beri sala bê dê pısqilêtê nebine."
"Belê raste rast", got bavo. "Lê vêya yeke kevn û erzan e, jı bo ku ew lı ser vê xwe hin bıke. A jı te re, Lotta!"
"Kevnbûn û erzanıya wê ji tıştek e", Lotta kefxweştır bû. Jı ber ku dı sersala bûna xwe de bû xwedıyê pısqilêtê.
Jonas got:"Vêya ne hewqas xırab e! Sıwar be, Lotta!"
Lotta lê sıwar bû û ajot. Jonas lı pê bazda û we gırt, jı ber ku kesi bawer nedıkır da wê Lotta karıbe pısqilêtê bajo. Lê gava Jonas destê xwe jê berda, dit ku Lotta bı rasti dıkare . "Çawa bıxwaze, pısqilêtê ûsa bajo. Bınêre, zarok bı rasti ji dıkare bajo", got dıya wê dı pacê de.Lotta qirıya, got:"Belê, bı rasti ji ez dıkarım bajom."

"Bala xwe bıdê, meta Breg", got bı qirin, çaxa ku jı ber mala meta Berg derbas bû.
"Mêzeke, ez karım pısqilêtê bajom!"
Û meta Berg jı paş sênca xwe, şaşbûyi mêzekır. Lê dûvra destê xwe rakır rast ber bı hewa û qirıya.
"Mêzeke, lı ser gulyê darê çı heye? "
Dı destê wê de bazınê Lotta, pegırtıbû.Wê gavê Lotta jı pısqilêtê ket erdê, jı ber ku mırov bı carekê nıkare hım pısqilêtê hım ji lı bazın mêzeke. Lê ew xırab nekete erdê, jı ber ku pısqilêta wê bıçûk û qasi wê bû.
Jonas û Mia Maria hatın, ku lı bazınê Lotta mêzekın, û Mia Maria got ku ev bazınê baştırin e ku wê dı jıyana xwe de ditıye.
"Êdi nıha tu nabêji, ku sersala bûna te baş derbas nebû", got Jonas.
"Naa, ez qet ûsa nefıkırıbûm", got Lotta.

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris



tut kurde de Paris



Û dûvra dı dora xani yê zer lı kuça Bråkmakar pısqlêta xwe ajot, dı destê wê de bazın û lı paşıya pısqlêtê ji Bamsen'ê wê Jonas û Mia Maria ji pısqlêt dıajotın, ew her sê bıhev re ajotın û vêya dıçû xweşa Lotta. Dı carekê de, Jonas destê xwe berda û pısqlêtê ajot. Wê gavê Lotta ji ramıya, ku ew ji dê ûsa çêke.

"Xwe bıgre", got bı qirin jı Bamsen re, "jı ber ku ezê nıha destê xwe berdım".
Û ûsa kır ji. Wê çaxê jı nışkê ve jı pısqlêtê pekıya û ket erdê. Pısqlêta wê ewqas bıçûk bû ji disa gava ket erdê, mılê xwe baş êşand.

"Te dit", Lotta bı hêrs qirıya bı ser Jonas de. "Hım qedexe ye ji, bıla bı bira te de bê!"
"Tu hin gelek bıçûk i, gelo tê dıghiji", got Jonas bı qirin. "Tu nıkari bêyi ku destê xwe bıgri, pısqlêtê bajoyi, tê dıghiji gelo!"
Lê Lotta navça kuçê rûnıştibû û ênişka xwe mızdıda û gelek bê deng dı devê xwe de dıpeyıvi, ku bes Bamsen karıbû bıbıhize: "Belê ez karım! Ez karım wek Jonas pısqlêt bajom!"

Institut kurde de Paris

Û dûvra hemû tev bıhev re çûn hundır û şiveke rasti ku jı bo sersala bûnê çebûbû xwarın.




KURDISKA FÖRLAGET / CAPXANA KURD - STOCKHOLM
BOX 5034 1163 05 Spånga - SWEDEN Tel: 08-117086
© Astrid Lindgren - Ilon Wikland - Visst kan Lotta cykla 1971
Wergerandina Kurdi - Capxana Kurd - Belê, Lotta kare bajo - 1982
Aarhuus Stiftsbogtrykkerie
ISBN 91 86146 03 3

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

ÇAPXANA KURD

ISBN 91 86146 03 3